1- Berî her tiştî, rawestandina êrîşên li ser ekranên telefizyonan û rûpelên facebookê, ji ber ku tu sûd jê nayê wergirtin. Her kes, partî, rêxistinên civaka sivîl û çarçewên kurdî, gerek li xwe vegerin û bi xwendin û karekî nû li hember vê pirsgirêkê rawestin.
2- Divê ku hemî penaberên Efrînê vegerin gund û bajarên xwe. Di vê qonaxê de ev bersiva herî giring e, da

Nûşîn Bêcirmanî

ku hewildanên guhertina demografî werin pûçkirin... ev ji hêlekê ve. Ji hêla din ve ev kurdên ku dê vegerin malên xwe, dê ji her berxwedan û serhildanekê re amade bin.
3- Kûrkirina rêveberiya hevbeş di hemî karên dibin û yên bibin de, da ev rêvebiriya hevbeş ji gelê kurd re bibe çandeke sereke û rojane, ne rêvebiriyeke tekalî be.
4- Miletê kurd li her çar parçeyên Kuridstanê, di hin şeran de şikestiye, lê cenga ji bo doza kurdî hîn neşikestiye. Ji ber vê yekê gerek e em bêhêvî nebin, ji ber şikestina di şerekî de ne jidestdana cengê ye. Em xweş bawer bin bi şervanên kurd û piştgiriya milet ji wan re. Ev doz û hemî dozên miletê kurd dê bi ser bikevin û ev milet dê her mafê xwe yê rewa bi dest bixe.
5- Di dawiyê de dixwazim wê yekê destnîşan bikim ku eger em li dîroka desthilata Tirkiyê vegerin, em ê gelek bûyerên trajedîk bibînin, wekî: terorokirina Sakîne Canciz û du hevalên wê li Parîsê, rûxandina peykerê Kawayê Hesinkar, bêrûmetiya li hember aleya kurdî û gelek qewamên din... Ev dide xuyakirin ku êrîşa li ser Efrînê, êrîşa li ser kurdayetiyê bi xwe ye.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Lêkolînerê Kurmanc ê Rojhilata Kurdistanê Perwîz Cîhanî: “ Rewşa ziman û ferhenga kurdî li Rojhilata Kurdistanê ji rewşa her sê parçeyên dî baştir e “

Diyar e ku di roja îroj de Kurdistana me çar parçe ye. Parçeyê herî mezin Bakurê Kurdistanê ye û di pê re Rojhilata Kurdistanê tê. Hem ji milê xaknîgariyê ve, hem jî ji milê danûsitandina rasterast ve têkiliyeke baş di navbera kurdên Bakur, Rojava û Başûr de heye. Lê belê kurdên Rojhilata Kurdistanê yek jê ji milê desthilata Tehranê ve hatine çewisandin û ya duyan jî ji hêla kurdên her sê parçeyên din ve bi yek carê hatine paşguhkirin. Me xwest bi rêya kirina evê hevpeyvînê, dîmenê çandî û wêjeyî yê kurdên Rojhilatê binrixînin û giraniyê bidin babeta kurmancên Rojhilatê. Lêkolînerê kurmanc Perwîz Cîhanî ku di gelek sazî û rêxistinên kurdên Rojhilatê de xebitiye, têra xwe dagirtî û tijî ye. Di vê hevpeyvîna ku Bûyerpressê pê re kiriye de, vegotin û şîroveyên bilind ên M.Perwîz bixwînin.

Hevpeyvîn: Ferîd Mîtanî

-Li nêva civata nivîskarên kurmanciyê, bawer im ku nivîskarên kurmanc ên Rojhilata Kurdistanê kêm têne dîtin. Dixwazim ku tevger û rewşa nivîskarên kurmanc ên rojhilata Kurdistanê binasim?

Durust e ku li Rojhilata Kurdistanê kesên ku bi kurmancî dinivîsin, hejmara wan ji tilîyên destekî jî kêmtir e. Ew jî dizivire ser rewşa jîyan û çawanîya civakê. Kurmancên Rojhilatê pişka zor li ser sînorên destkirên nîveka Tirkîye û Îranê dijîn. Heta salên 90’î jî ji sedan 95’ê gundên kurmancan bêy xwendinxane bûn. Dewleta Îranê çi di dema şah da û çi jî di dema şêx da, ev siyaseta qirêj û li dijî gelê kurd bi giştî û li dijî kurmancan bi taybetî meşandîye. Kurmancên Rojhilatê bindestên bindestan in. Li hemû bajarên kurmancan azerî li bara kar û barên îdarî da serdest in. Hêza hakim li bajarên kurmancan azerî ne. Ca dema ku ji %95 gundên kurmancan bêy xwendinxane bin, nivîskar dê ji kû bên?

Ev rewşa li hemû waran, li warên aborî, sîyasî û ferhengî/çandî jî wekî hev e. Wate kurmancên Rojhilatê di hemû warên jîyanê da bindest mane. Ustan yan wilayeta ku kurmanc tê da dijîn, navê wê kirine Azerbayicana Rojava. Lê %70 ji sedî heftêyî daniştîyên vê ustanê kurd in. Dema ku ez li sazimana koçeran dixebitîm, min li ser vê hindê gilînameyek ji berpirsên rijîma Îranê ra şand, ku heyetek ji Tehranê hat û li ser vê mijarê lêkolîn kir, lê dewlata merkezî li ber hevmezhebîyê her dem azerîyan li ser kurdan ra digirin. Her dema ku desthelatên azerî bixwazin dikarin bi navên curbecur kurdan li bal hukûmeta merkezî bednav bikin û ji holê rakin.

Mirov dikare bibêje ku wêjeya kurmancî li Rojhilata Kurdistanê bi cûreyekî cidî, di gel weşandina Kovara Sirwe ra dest pê kir

-Tu bi xwe bi tîpên latînî dinivîsî. Wêjeya kurmancî ya nivîskî li Rojhilata Kurdistanê kengê dest pê bûye?

Ez bi xwe bi her sê rênivîsên kurdî: latînî, aramî û kirîlî dixwînim û dinivîsim. Mêjûya nivîsîna bi latînî dizivire serdema Kovara Sirwe. Kovara Sirwe ku sala 1984’an li bajarê Ûrmîyê bi herdu zaraveyên soranî û kurmancî diweşîya û ez bi xwe jî yek ji damezrînerê wê kovarê bûm, pêş da herdu zaraveyên wê jî bi rênivîsa aramî dihate weşandin. Lê li dû ra me pişka kurmancî bi rênivîsa latînî weşand.

Mirov dikare bibêje ku wêjeya kurmancî li Rojhilata Kurdistanê bi cûreyekî cidî, di gel weşandina Kovara Sirwe ra dest pê kir. Lê muxabin li ber rewşên heyî ku min li jorê amaje pê dan, rewşa wêjeyê di wê pişka Kurdistanê da lawaz e û wekî pêdivî pêş neketîye.

-Di nava civaka kurmancên Rojhilatê de, hetanî çi radeyê ziman, çand û jiyana kurdî li kar in?

Tenê tişta ku dilê mirovî xweş dike ew e, ku di gel hemû zor û zulm û zextên rijîmên Îranê li ser kurdan, li dirêjaya mêjûyê da axaftina bi zimanê kurdî li Rojhilata Kurdistanê nehatiye berbendkirin. Evê hindê hîştîye ku ziman û ferheng/çanda kurdî ta radeyekê destnexwarî bimîne. Lê eger zimanek nebe zimanê xwendin û nivîsînê, çi car nikare pêş bikeve. Eva nêzîk çil salan e ku rijîma Îranê li makedestûra xwe da mafê xwendina bi zimanê kurdî li dibistanan da pejirandiye, lê muxabin ta roja îro ew madeya destûrî tenê li ser kaxezê maye.

-Desthilata Tehranê çawa ji nivîskar û xebatkarên kurmanciyê nêzîk dibe û hetanî aniha çi zordarî û binpêkirin der heqê nivîskaran de bûne?

Rijîma Tehranê ne tenê di gel nivîskarên kurd di gel hemû nivîskarên ku wekî wan nafikirin, dij in. Ta niha bi dehan nivîskar li Îranê bi şêweyên curbecur hatine kuştin û terorkirin. Bi dehan nivîskarên kurd û ne kurd îro bi neçarî li tarawgehê dijîn. Ew nivîskarên ku li Îranê jî mane, bi neçarî debê li ser dilê rijîmê binivîse. Pişka zor a nivîskaran tûşî xudsansorîyê bûye.

Ew derbên ku pertîyan li wêje û zimanê kurdî dane, neyaran lê nedane

-Partî û rêxistinên kurdî yên Rojhilatê, ta çi astê guh didin geşkirin û vejiyandina ziman û çanda kurdî?

Muxabin hemû partîyên Kurdistanê li her çar parçeyan zimanê wan ê dîwanî, zimanê dewleta wan a dagirker e. Zimanê partîyên me ji qenc û xerabên wan hema yê hemûyê: tirkî, erebî û farsî ye. Evê hindê derbên kujinde li ziman û çanda kurdî daye. Li nav gelek partîyên me da hê jî (dîl araçdir) ziman wek amîrekî tê nasandin. Lê ji bo me kurdan ziman nasnameya hebûna me ye. Tenê tişta ku îro kesên kurd pê tên nasîn, ziman e. Eger ew jî ji dest me here, êdî çi pênaseya me weke kurd namîne. Mamosta û rêveberên civakekê bi çi zimanî xwe raber bike, şagird û peyrewên wan jî muxabin wekî wan difikirin. Muxabin partîyên me di vê barê da şaşîyên mezin kirine. Ew derbên ku pertîyan li wêje û zimanê kurdî dane, neyaran lê nedane. Ka kîjan nivîskar an helbestkarê serketî ji nav partîyên me derketine!?

Hejmara kurmancên Rojhilatê nêzîkî du milyonî heye



-Belku bersiva evê pirsê ne pêkan jî be, lê dixwazim zanibim ka hejmara kurmancên Rojhilata Kurdistanê çi qas e?

Salên 1983 û 1984’an ez di sazimana koçerên kurd da wekî lêkolîner dixebitîm. Ez bi ekîba xwe va em ji kirrê Araratê ta Şinoyê gund bi gund gerrîyan. Karê me serhejmarîya kurmancan û lêkolîna li ser jîyana wan û sistema eşîretîyê bû. Hînga hejmara kurmancên Rojhilatê ser mîlyonekê ra bû. Piştî sî û çend salan debê roja îro hejmara kurmancên Rojhilatê nêzîkî du milyonî heye. Kurmanc di bajarên: Makû, Puldeşt, Şot, Qelenî, Xoy, Qerezîyadîn, Selmas, Ûrmîye û Şinoyê de dijîn. Lê ji bilî van kurmancan, kurmancên Xurasanê jî hene ku hejmara wan digîje sê milyonan.

-Rewşa ziman û çanda kurdî li Rojhilata Kurdistanê ber bi çi pêngavê ve diçe?

Bi giştî rewşa ziman û ferhenga kurdî li Rojhilatê Kurdistanê ji rewşa her sê parçeyên dî baştir e. Îro di Rojhilata Kurdistanê da bi dehan kovar û demname bi kurdî têne weşandin. Bi dehan nivîskar û helbestkarên naskirî peyda bûne. Pirtûkên kurdî yên wêjeyî, ferhengî/çandî bi sansoreke hindik têne weşandin. Lê sansorên giran li ser berhmên dî hene.

-Der barê kesayeta te de, te çawa û kengê dest bi nivîsîna kurmancî kir?

Ew cihê ku ez Lê hatime cîhanê, navçeyeke çîyayî ye. Navçeya Elendê dikeve nîveka navçeyên Kotol, Sokmanava û Qerederê û ji layê rojava va jî di gel Kurdistana jêr lekmên Tirkîyê hevsînor e. Di van her çar navçeyên ku navên wan hatin û hejmara gundên wan nêzîkî 100 gundî ye, di serdema me da li nav van hemû gundana bi zorê du sê kesên xwenda peyda dibûn. Ew jî mela û nîvmela bûn. Lê di wê serdemê da di navçeyeke wisan dûrketî û şaxawî da di mala me da pirtûkxaneya me hebû. Ez di nav wê pirtûkxaneyê da mezin bûm. Li jorê jî min got rijîmên dagirkerên Kurdistanê her dem têkoşîne û têdikoşin ku gelê kurd di rewşeke nexwendewarî û nezanîyê da bihêlin. Lê malbata me ku malbateke xwenda û mîrza bû, li dijî vê rewşê xebitî. Dewleta Îranê bi cûreyekî resmî ji me ra dibistan çênedikirin û xwendebêj nedişandin, lê bavê min bi pareyê xwe ji me ra xwendebêjek girt û ez bi wê rêkê di gel xwendin û nivîsînê nasyar bûm. Hînga hîç kovar an rojnameyeke kurdî tunebû, tenê rêveberên me yên toreyî radyoyên kurdî bûn. Li dawîya salên 70’yî min dest bi nivîsîna helbestan kir û min helbestên xwe ji wan radyoyan ra dişand. Wate karê min pê nivîskarîyê hînga dest pê kir.

-Tu çawa dîmenê wêjeyî û çandî li Rojavayê Kurdistanê dinirxînî?

Pêşketina wêje û çandê bi pêşketina civakê û rewşa jîyana gel va girêdayî ye. Gelê ku ji hemû layan va li jêr givişk û tivijkên neyaran be û bi komelî di qada şerî da be, dîyar e nikare wisan ku pêdivî ye li ser wêje û çandê bixebite. Lê gelê kurd li Rojava di gel van hemû gîrodarîyên siyasî ta radeyekê karîye barê giran ê wêjeyê jî bide ser milê xwe. Lê muxabin derfetên jîyana wêjeyî wisan ku pêdivî ye hê jî nerexsaye.

-Aniha li Rojavayê Kurdistanê şoreşek li dar e û êdî guhertinên berbiçav dibin. Weku nivîskarekî Rojhilata Kurdistanê tu çawa li vê babetê dinihêrî û bi dîtina te rewşa Rojava ber bi kû derê ve diçe?

Ez pir ji siyasetên navnetewî ditirsim. Eger gelê me nebe yek, di hîç deverekê da nikare bi ser bikeve. Serketina me li gireva yekbûna hêzên me da ye. Dema ku li parçeyên dî yên Kurdistanê ne tenê bira arîkarîya birayê xwe yê Rojavayê nake, belke bi ser da jî dergeyên xwe li ser birayê xwe da dadixe û li qada siyasetê da jî li ber duhola neyaran direqise, pêşketina netewî lawaz dibe. Muxabin gelê kurd hê jî nikarîye xwe ji helboqeya partîyan rizgar bike, hê jî nikare netewî bifikire. Eva derdê gel ê herî mezin e. Bi kurtî serketina me wekî gel ne wekî partî, hînga ye ku hestê netewî serdestîyê li hestê hizbayetîyê bike.

Di gel van hemû gîr û giriftan, berxwedana gel li Rojava bera cîhanê hemûyê li ser xwe da rakêşaye. Ev şoreşa ku li Rojavayê dest pê bûye, debê bibe nimûne ji dîtir parçeyên Kurdistanê ra.

-Derfetên Rojhilata Kurdistanê êdî ne alîkar in ku raperînek li wir rû bide û statuyeke kurdî ava bibe?

Na wisan nîne, her dem derfet hene, vê gavê şoreşên li wê pişka Kurdistanê weke agirê di bin arî da ne. Tenê tişta lawaz jihevketin, dijayetî û yeknegirtina hêzên sîyasî ye. Dema niha rewş ji her wextî zêdetir guncawtir e.

Bi yek gotinê:

-Di vê jiyanê de û di nava evê xebatê de, armanca te çi ye?

Xizmeta ziman û toreya gelê kurd bi taybetî û mirovanîyê bi giştî armanca min e.

-Gotina herî xweş ji bo te?

Azadî.

-Gotina herî ne xweş?

Bindestî.

-Di nava nivîskarên kurmaciyê de, herî zêde ji kê re dixwînî?

Gelek kes hene, lê hanîna navan ne karekî durust e. Ji hemûyan jî hez dikim. Roja îro her kê tenê yek peyveke kurdî jî bi durustî binivîse, ez destên wê/wî maçî dikim. Lê muxabin hejmara nivîskarên kurd ji hejmara xwendevanên berhemên kurdî zêdetir e. Hema kî karibe navê xwe bi kurdî binivîse, xwe nivîskar dizane. Eva jî derbeke mezin li wêje û zimanê kurdî dide.

Bila ez li ser axa welatê xwe bihatama dardekirin, ne ku li Awropayê bibama penaberekî bêpenah

-Tu li çi poşman bûyî?

Ez li hatina xwe ya Awropayê poşman bûme. Bila ez li ser axa welatê xwe bihatama dardekirin, ne ku li Awropayê bibama penaberekî bêpenah. Lê muxabin êdî bihorî, tişta çû nede dû.

- Gotina dawî…

Gotina min a dawî dermanê derdê me kurdan yekîtî ye. Em hev bigirin çi kes nikare zora me bibe.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Di Navbera Niştimanperwerî û Faşîzmê de

Şahînê Soreklî

Niştimanperwerî tiştekî baş e. Ji bo milletekî li dû mafên xwe yên neteweyî pêwîstî ye. Di van salên dawîn de hestê neteweyî li nik kurdan bilind û berfirehtir bû. Ev tiştekî baş e. Nivîskar û siyasetmedarên kurdan bi salan ji bo bidestxistina wê encamê di kar de bûn. Lê mixabin hestê niştimanperweriyê ji bo hinekên tênegihîşt yan mêjîşuştî ji aliyekî ve tenê çermî ma, yanê çerm derbas nekir. Ji aliyekî din ve sînorên niştimanperweriyê derbas kirin û ket nav sînorên faşîzmê.

Niştimanperwerî hezkirina ji miletê xwe ye, evîndariya bi welatê xwe re ye, têkoşana ji bo mafên rewa yên gelê xwe ye. Niştimanperwerî ne kûrkirina pêlên kînê û nefretê ye, ne riswakirina neteweyên din e, ne xayînkirina kesên xwedî baweriyên din e. Yekî elmanî maf heye bibêje "Ez ji Elmanya hez dikim, ez ji zimanê milletê xwe hez dikim, ez amade me ji bo parastina welatê xwe li ber xwe bidim, …" lê dema bibêje "Deutschland über alles in der Welt" (Almanya li ser her tiştê li cîhanê re ye), wekî di dema recîma nazî de hat gotin, wê demê dibe faşîst. Ta roja îroj, 73 salan li dû dawîhatina recîma Hitler, hîn jî durişma "Deutschland über alles in der Welt" wek sîmbola naziyan û şermezariyeke bo dîroka elmanan dihêt hesibandin û îroj li Elmanya qedexe ye. Faşîzm ziyaneke weha digihîne milletekî ku şopên wê yên nerînî dikarin bi sedan sal bimînin.

Mixabin hinek ji kurdan, her weha endamên hinek gelên din, tenê nerindiyên aliyên bi wan re dijmin dibînin, ne yên xwe. Dema ez rojên îroj li facebookê dinihêrim, ez gelek şanên faşîzmê di nav kesên kurd de dibînim. Ev kesan weha dizanin ku bindestiya kurdan maf dide wan ew gotina bixwazin bikin, yan dibêjin "dijminê me jî ji kurdan re weha û weha dibêje, kurdan dikuje, welatê me dagirtiye…" Mirovê aqilmend û têgihîşt divêt zanibe ku her tişt ne hema ji reş an spî pêk dihêt. Di navbera wan de gelek reng hene. Ya din, heta ger di nav tirk, ereb û farisan de aliyên faşîst hebin, me maf niye tevahiya milletê tirk, ereb yan faris riswa bikin û her weha, … Riswakirina gelemper (عام) ne tenê faşîzm e, lê ziyanafer e (يؤدي الى نتائج سلبية) û kînê û nefretê di nav milletan de kûrtir dike, neyariyê berfirehtir dike, siberoja nifşan ji aramiyê bi dûr dixe.

Kurd û milletên din bi sedsalan li kêleka hev jiyane û bixwazin-nexwazin ew ê her li kêleka hev, yan bi hev re bijîn. Kûrbûn û berfirehbûna kiryarên faşîst di nav komên rojhilatnavînî de dê misoger bikin ku aramî û aştî ji tevahiya herêmê dûr bimînin. Beşên din li dunyayê dê pêşvetir biçin û komên hevrik û şerfiroş dê hev bixwin û paşvetir biçin. Dem hatiye ku hişmendên miletên Rojhilata Navîn rê li faşîzmê bigirin, kêşeyên hene bi axaftinê û li gor mercên adilmend çareser bikin, li hember hev bi tolerans (tehemul) bin.

Mixabin hatina komên tundrê yên wek DAIŞê derfetên berfirehtirkirina faşîzmê zêde kirin. Rêxistinên îslamî yên tundrê rê li pêşkevtin û berbihevhatina miletan teng kirin. Ger endamên miletên herêmê bi raman û kiryarên xwe ve nehên guhertin, ew ê rê ji vegera rêxistinên tund û yên faşîst re vekin û tevahiya herêmê dê têkeve nav tarîtiyeke malwêrantir. Ger weha bibe hemî miletên herêmê dê ziyanê bibînin.

Hêvîdar im ciwanên me li şûna bijartina kiryarên tund û tûj li zimanê xwe, li çanda xwe û li herêmên xwe miqayit bin; zanîna xwe pêş ve bibin û bi mentiq gavên xwe ranin, ji bo bidestxistina mafan û jiyaneke baştir a li gor demê. Mixabin bicihkirina van daxwazan di rewşa îroj de ne hêsan e. Li welatekî wek Sûriyeyê û li herêmine kurdan xelk êdî jiyana xwe bi rojekê ve girê dide û li benda roja din e. Pêşvexistina ramanên nirxbilind gelekî dijwar e, zehmet e. Lê îroj bi sedhezaran Kurd li derve hene. Qe nebe divêt ew xwe di warê prensîpên mirovahî de ber bi pêş bibin, li şûna noqbûna di gola fasîzmê de.

Pêş gotarê bi dawî bihînim tenbeyek: Ger mirov bixwaze gotinên di dilê xwe de ragihîne, dikare bi peyvên guncav (munasib) yên zimanekî ragihîne, li şûna peyvên riswakirinê, heqaretê û gotinên gemarî. Peyvên guncav û mentiqî encamên baştir bi dest dixin.

Gotarên ku tên weşandin, nerînên xudanên xwe ne.

Şîrmijên Efrîna Min



Cîhan Hesen

Demeke tîr, şev razayî, çiyayên bibejin xwe hildabûn ser welêt; heyvê jî pala xwe dabû çiyayan. Bayekî kurr ji gundan dihat, pê re dengê şirqîniyan, darên zeytûnan dijenandin. Te digot qey ba û darên welatê min bi hev re şer dikin. Dayîkan jî zarokên xwe berxew dikirin, bi ramûsan û çîrokên xweş, zarokên xwe hembêz dikirin û ew deng dibirîn.

Di xewên zarokan de jî ken, kêfxweşî û lîstokên dibistanan dibûn mêvanên şeva wan. Bi wê heyecanê, di xewê de ken bi lêvên wan diket. Dayîk di nîvê şevê de ji nivînên xwe derdiketin, dihatin lihêfa zarokên xwe hildigirtin ser wan, bi wê bişirîna ku xwe sipartibû nîgaşên zarokên wan, jiyan bi wan biçêj dibû.

Bi şevê çend caran ji xew radibûn û dibûn parêzvanên karxezalên xwe.

Sibehan bi kela kêfxweşiyê ew bi rêya dibistanê dixistin .

Bavê wan jî bi ramûsan û hêviya rojeke xweş, ew hembêz dikirin. Wisa ji Çiyayê Kurmênc dadiketin dibistanên xwe.

Wisa bi kurdîbûna xwe, lîstokên kurmancî dilîstin û bi zimanê ewê dayîka kedkar, di xwendinê de bi ser diketin .

Jixwe kenîn û xweşikiya zarokên welat, ji xweşikî û bilindahiya Çiyayê Kurmênc bilindtir bû.

Jiyaneke hevpar, bêêş û bêgirî didomandin.

Jiyaneke wekî rengê zeytûnan kesk û xwezayî dijiyan .Ji ber ku xwezaya welêt, navika azadiyê di bin her darekê de çandibû. Gulîsor û şêgeleyên welêt ew navik û dar av didan, tovên azadiyê jê diweşandin.

Wan; ew şev, roj û xeyalên wan di rojeke giran de bi ser wan de hilweşandin. Hin zarok li gel xeyalên xwe di bin bermahiyên hilweşînê de man… ne ew derketin, ne jî xeyalên wan .

Zarokên ku ji kenê xwe giravek ji xwe re çêkiribûn, zarokên ku ji pelên zeytûnan tacek ji xwe re çêkiribûn, zarokên ku ji libên zeytûnan gerdenek ji xwe re çêkiribûn; zarokên welatê min bûn ew… bêken, bêtac û bêgerden di axa welêt de nivistin. Neyaran çi ji xeyalên zarokên welatê min kir?

Kirin ku dayîk di binerdan de bilorînin, newêribin têr êşa kezebê ji hundirê xwe, bi girî derxin.

Kirin ku rûyên zarokan ên çeleng, nîvrû li dayîk û bavên wan vegerin.

Kirin ku zarokên mayî jî, bi tirs û bi girî ji xew veciniqin û ji xofa bumbebaranê di zivistanên bêdilovan de ji malên xwe der bibin.

Xwestin ku zarokên me bêxeyal bimînin, bi çiyayên xwe re mezin û bilind nebin. Çi gunehê wan hebû ku ew bi azadiyê re û azadî bi wan re digirnijî?

Rûyên zarokên evî welatî, layiqî serkeftinê ne ku azadî ji wan naqere.

Erê wisa ye, xeyalên ku bi kurmancî xeyal dikirin, hêja ne ku bi tivinga kurmancî bi ser jî bikevin .

Efrîna ku buhayê çavên wê yên zeytûnî palewan bû, va ye gelek palewanên bi qasî çûkên li ser darên xwe, hembêz kirine.

Dîsa bi êşa giran re li ber xwe didin û êşê red dikin. Dikin ku wek çiyayên xwe sozdar, dilêr û bilind bin.

Ev in zarokên welatê min.

Ev in şêrgeleyên welatê min.

Ev in çavkeskên welatê min.

Û ev in şîrmijên Efrîna min.

Cejna Zarokên Cîhanê

Selam Darî

Ez Cejna Zarokan li hemû zarokên cîhanê û Kurdistanê pîroz dikim û pîrozbahiyeke taybet bo zarokên Kurdistana Rojava yên ku penaber bûne. Silaveke taybet ji zarokên Kampa Domîzê re yên ku zehmetiyeke zor dikêşin.

Eger ne ji zarokan bûya, tu carî dayîk fêrî lorandinê nedibû; dêmek zarok dahênanê bi xwe re tîne. Jiyan bi zarokan xweş dibe; di kolanên bajaran de û li ser bênderên gundan qerebalixa wan, leystikên wan, kenê wan…

Wekî ku hûn dizanin zarok mêweyên jiyanê, nifşê paşerojê û firişteyên li ser rûyê zemînê ne. Her wiha mizgîniya herî mezin di jiyanê de bi zayîna zarok re tê. Di perwerdekirina civakan de zarok bingeh in, ji lew re pêdivî bi guhdaneke taybet ji bo zarokan heye. Hemî rêbazên perwerdeyê berê xwe bi xurtî daye perwerdekirina zarokan, ji ber ku avakirina civakeke durist û pêşketî, bi avakirina kesayetiya zarokan dest pê dike. Ji ber ku bi zayîna zarokan re kesayeteke avakirî naafire, lê belê bi rêya danûsitandina bi derdorê re û wergirtina perwerdeyê, kesayeta zarokê ava dibe.

Zarok mirovekî hestyar e û dikeve di bin bandora jîwerê xwe de, lewma kurd dibêjin: "Dilê zarokan dagirtî ye, lê devê wan nagere."

Dema ku Can Cak Roso (Jean-Jacques Rousseau) bang kir: "Zaroktiyê binase!" mebesta wî ew bû ku em pêdivî û xwestekên wan bizanin, da ku em karibin rêya perwerdeya rast bo wan peyda bikin.

Li gorî gotina feylesûfekî din jî: "Mejiyê zarokan mîna kaxezeke sipî ye, tu çi tê de binvîsî, ma ew."

Îcar berpirsyariya me li beramber zarokan mezin e. Divê em çavdêriyê li wan bikin û sincên pak ên wek: mêranî, ciwanmêrî, rastî, alîkarî, dilsozî û hwd.. bi wan xweş bikin.

Ereb dibêjin: "Wergirtina zanistê di zarotiyê de, mîna kolana li ser kevir e." Ev mejiyê teze, zû bi zû tiştan ji ber dike û tu caran ji bîr nake. Tişta ku vê yekê jî tekez dike ew e ku çîrokên di zaroktiyê de ku min ji dêya dibihîstin, ta aniha di bala min de ne; wekî çîrokên: Şengê û Pengê, Zîlanê, Gur û Rovî, Rovî û Dîk û hwd…

Gelî biraderan: Rijîma Be'esê li Sûriyeyê şerekî dijwar li dij zimanê me dikir. Ji ber dizanîbû ku hîmê bingehîn ê hebûna her miletekî, zimanê wî ye. Evê siyaseta çewt, ziyaneke mezin gihand pêvajoya zanînê. Her wiha bi van pîlanên xwe yên şovînist, dergehê pêşketinê di toreyê de girt. Îcar di rewşeke wiha de, normal e ku toreya zarokan jî li paş bimîne. Ev rasteqînî wê hingê diyar dibe, dema ku li Rojavayê Kurdistanê mamosteyên pispor kêm têne dîtin.

Tore çi ye?

Em dikarin der barê pênaseya toreyê de bibêjin ku tore: Berhevkirin an jî wênekirinek e.

Li Rojavayê Kurdistanê toreya zarokan du beş in:

1- Toreya Devkî – Gelêrî:

Ev tore bi xwe gencîneyeke dagirtî ye. Gelek nivîskarên Rojavayê Kurdistanê danehev û kolana li vê toreyê kirine karê xwe yê sereke. Ewan nivîskaran bi vî karê pîroz, ev rengetore parast. Yek ji lêkolîner û berhevkarê evan parçeyên folklora zarokan birêz Rezoyê Osê ye ku 5 kom ji çîrokên zarokan di sala 2005'ê de çap kirine, ew jî ev in: Dîk Dîko - Libhinarê - Bavê Hepûn - Şengê û Pengê - Finda Şemal.

2-Toreya Nivîskî:

Toreya zarokan a nivîskî ew e ya ku ji hêla nivîskaran ve hatiye berhemdan. Çend nivîskarên Rojavayê Kurdistanê yên ku ji zarokan re nivîsîne, ev in:

- Nivîskar Ferhadê Içmo berhevokeke helbestên zarokan bi navê "Landik1" nivîsiye û hunermenda hêja Itîdal jî ew helbest sitrandine.

Ez ê li jêrê çend malikan ji helbesteke "Landik1" rêz bikim:

"Çûko çûko sefarî

Min ji te re got sed carî
Veger li hêlîna xwe
Va ye baran dibarî
Îro berf û baran e
Roja xewa giran e"

- Nivîskar Ehmed Ismayîl hin şanoyên zarokan bi zimanê erebî nivîsîne, wek:توبة الثعلب û البارزاني

- Nivîskar Konê Reş komeke helbestên zarokan bi navê "Sîpan û Jînê" ristine.

- Nivîskar Osman Sebrî jî hin çîrok li ser zimanê lawiran ji bona zarokan çap kirine, wekî: Dîk û Rovî.

- Seydayê Cegerxwîn jî hin helbest bi çîrokî di dîwanên xwe de ji bo zarokan ristine, mîna: Şêr û Piling ku tê de dibêje:

"Şêr û piling tev de çûn
Rastî serîk penîr bûn
Vî jê xwar û wî jê xwar
Herduwa li hev dane dar
Yekî ji ê dî re got
Herdû rabûn bûne cot
Go em herin cem rovî
Seydayê weh û kovî"

Lê mixabin çawa ku berhemên toreya zarokan kêm in, wisa jî xwendevanên wê kêm in. Li hember pirsgirêkeke wisa, em gihan baweriyekê ku pêwîst e em bi nifşên nû dest pê bikin, da ku em xwendevanan pir bikin, ev ji hêlekê ve… ji hêla din ve jî da ku bibe wekî bersivdanekê ji vê biryara şovînî ya qedexekirina zimanê kurdî re.

Li hember vî şerî min, Hefîz Ebdurehman û Xalid Muhemed me pirtûkek bo fêrkirina zimanê kurdî bi navê "Pirtûka Min" çêkir.

Ji ber ku ez mamoste bûm, hayê min ji rêbazên fêrkirinê hebû. Me rêbazên fêrkirinê wekî rêbazên erebî û ingilîzî danîn. Bi şêweyekî zanistî û perwerdeyî û li gorî rêbazên nûjen em pê de çûn. Ev pirtûk ji zarokên ku berî herin dibistanê re ye, ji ber ku asta wê ya destpêka xwendinê ye. Bi rêyeke hêsan zarok fêrî zimanê xwe dibe. Pirtûk 70 rûpel e. Ji hêla kêsmê xwe ve gelekî ciwan e û bi wêneyên rengîn xemilandî ye. Cil û bergên kesan di pirtûkê de modern in. Derhênerê vê pirtûkê Luqman Ehmed e, ew şêwekarekî bi nav û deng e. Vê pirtûkê zû bi zû cihê xwe girt, ji ber ku cara yekem bû ku pirtûkeke zarokan bi vê ciwaniyê li Rojavayê Kurdistanê derdikeve. Me 4000 hejmar çap kirin, lê kêmî sê mehan hemî hatin belavkirin. Me dixwest ku bi rêya vê pirtûkê em her maleke kurd, bikin dibistanek. Mebesta me ew bû ku em mafê zarokan ê fêrbûna zimanê dayîkê bidin wan. Ji lew re me li tevahiya deverên Rojavayê Kurdistanê dest bi korsên fêrkirina zimên kir. Hêja ye mirov bibêje ku hetanî îroj jî bi rêya vê pirtûk perwerde tên dayîn.

Pêwîst e her kesek zanibe ku qonaxa herî girîng di jiyana zarok de, qonaxa berî çûna dibistanê ye. Gerek e di wî temenî de em wekî dê û bav berê zarok bidin xwendinê û jê re bixwînin. Bi vê proseyê du armanc bi cih dibin: Yek jê civakî ye û ya din perwerdehî ye. Bila diruşma me ev be: "Ji Zarok re Bixwîne." Ew jî bi mebesta ku zarok bi xwendinê re şad bibe û di temenekî biçûk de pirtûk bibe dosta wî ya herî nêzîk.

Em hewl bidin ku kesayeteke serkeftî di hemî warên jiyanê de ava bikin û dergehên paşerojê bi berfirehî li pêş wan vekin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestine Bijartî... Ibrahîm Ebdî

Helbestvan Ibrahîm Ebdî di sala 1971'ê de li gundê Rişêdiyê yê bi ser bajarê Hisiçayê ve hatiye dunyayê. Ew jî wekî gelek kurdên hevdemên xwe, ji nasnameya Sûriyeyê bêpar bû, ji lew re xwendina xwe nedomand. Di sala 1988'ê de fêrî xwendin û nivîsîna kurmanciyê bûye û ji wê hingê ve hewildanên wî yên nivîsîna helbestê dest pê bûne. Ta roja îroj hêj berhemên wî çap nebûne, lê di gelek rojname û kovaran de nivîsiye.
Xelata Baştirîn Helbesta Kêşesaz di Festîvala Helbesta Kurdî ya 14'emîn de wergirtiye.
Di helbestên xwe de herî zêde giraniyê dide babetên welat û neteweyê û her timî banga niştimanperweriyê di helbestên wî de berz e.

GAZINEK

Birayê biçûk im
Di nav çar bira de
Xebatê dikim
Di ber wan de tim
Mi xwîna ciwana
Dida û didim
Heta min ji bîr kir
Ku ez jî heme
Ji ber ku bi doza
Mezin ewle me
Mixabin.. mixabin
Birayên mezin
Nerîneke din
Dinêrin li min

ŞAŞIYÊN MEZINAN

Ji leylanê dirêsan hêviyên xwe
Bi xweşxewnan nerînên xwe dipêçan
Ji ber zorê ji ber mirinê bi der bûn
Ji wana hin li xweşbûnê digeryan
Nizanîbûn ku mirinê davikên xwe
Di derya de vedaye l' pêşiya wan
Nizanîbûn ku rewrewke buhişta
Buhayê wê jiyana xwe ji dest dan
Heval û hemdem û zaroktiya xwe
Bi avê re hemî tiştên xwe berdan
Cihên kû lê xwedî bûne firotin
Ji bona kû nemînin ew ji kerwan
Mezin va şaşiyên mezin dikin hîn
Bicûk jî zû didin ser rêçika wan
Ji kê ez dê bikim gazin û loma
Ji kona yan ji rêber û kesên zan!?
Heger her kes bi erkê xwe nerabit
Em ê kengî bi dest xin rûmet û şan
Heta her yek bibêjit min çi jê ye
Em ê kole bimînin him perîşan
Gelo ev xak nehêja ye heta kû
Bi hêsanî, wisa ew tête berdan?
Belê ev şar û bajarê me ne ew
Çi hêja ne, ji bo wan bibine qurban!?
Çi qa te'l in berên azadiyê ger
Neyên şuştin bi xwîdana lehengan
Belê şêrîn dibin gelkî dema kû
Bi xwîna pakrewanan têne avdan

NISRÎN

Heger Nisrîn were ba min
Ez ê çi bkim ji nisrînê
Ez ê çi bkim ji beybûnê
ji yasmîn û ji wê bînê
Li ber dergahê gorê me
Nexweş im pir di vê jînê
Heger ku ew were ser min
Ciwan û naz û şêrînê
Ew ê can dîs vegerrîn laş
Di laşê m bigerîn xwînê
Çiqasî ez dixwazim jê
Ku bê li ber serê m rînê
Tilên nazik bidî ser dil
Vegerrîn lept û him tînê
Li ber çava be her gavê
Biaxêve tu narînê
Bibêj wey Kesero jaro
Tu bes bik qîr û nalînê

XWARINA AXÊ

Min bi zaroktî berî ku şîr vebim
Zuxur û axa welat, min pir dixwar
Ser zimanê min çi tiştên xweş wiha
Hêj nebûrîne û nabûrin tu car
Ne ji birçîna mi ev tişta dikir
Dayikê wer gote min çend car û car:
"Min nehişta tu ji wê axê bixwî
Te li min tanîne hev bajar û şar"
Min bi zaroktî berî ku şîr vebim
Rûmeta axê bi şîr re min vexwar
Lê nuha jî mezin im û bîr dibim
Bûm penaber digerim ez war bi war
Ger bihêlin li welat ez vegerim
Dê bixwim axa welat deh qat û par
Nuh mi nas kir bo çi min ew tişt



dikir
Ez ne şaş bûm wê dema min ax dixwar

XALA DILBER

Ez ê cerg û kezeb û dil ji dostê re verêkim
Bikim name diwêta wê ji xwîna dil xwe çêkim
Di namê de birînê dil ji nazê re xuya kim
Ji bo nas ke di meydana evînê de çi pak im
Bixwazim jê bi hûrbînî wê peyxamê bixwîne
Ewê xala çena pîroz ji miryê xwe r' bişîne
Nizane ku ji bo xalê çiqasî bendewar im
Li bendî bersiva wê me li ser pêtek ji ar im
Rewanê min girêda ye bi wê xala çena boz
Ji bîra min ti car nare dilovana cegersoz
Di bîra m tê di her gavê heta d' xewnê şeva de
Di zindana, li seyana, di nêv bexçê gula de
Di bîra min de ye bozê di her çaxan û gava
Peres mame li wê bejnê, ji bo dêm û du çava
Belê bêtir ji Ferhad û Memo ez evîndar im
Ji dûrbûna zirava xwe çi qa jar û hejar im
Çi bêrya wê dikim her dem hişê min tim li bal e
Ev e rewşa evîndara Keser tu bes binale

CANA LIHEVHATÎ

Di jîna mi d heye canek
Delal û nazik û boz
Di rengê wê li cîhanê
Tu kes nîne cegersoz
Bi nav û deng û nîşan e
Li gerdûnê seraser
Çi gava wê dibînim ez
Li min roj dibe Newroz
Çi gava wê dibînim ez
Demê min xweş dibin pir
Ji nava dil bi der tîne
Bizot û pêtê agir
Di zevya dil diçîne tim
Evîn û doz û peyman
Evîna ku dil û cergêm
Ji nêv laşê mi rakir
Li ser wê min sipî kirye
Bi carek porê wek şev
Li ser cana ku navê wê
Ti carî nakeve j' dev
Buhara min dibî payiz
Heger ku wê nebînim
Bihişta xweş dibî doje
Bi min tal dibî hinguv
Ji bo cana lihevhatî
Bi arzanî didim can
Didim can û rewanê xwe
Buhayê her du çavan
Ewan çavên tijî hêvî
Dilê min kirne talan
Ji ber wan min nema aram
Tenê ma qîr û fîxan
Keser îro çi xemgîn e
Ji ber dûr e ji dilber
Dilê wî tev de kovan e
Şikîn lê basik û per
Çiqa tal e jiyana wî
Zilindar şekir e li ber
Li rewşa wî bimeyzîne
Tu çarê jê r bikî der

ŞAHINŞAHA GERDÛN

Dilbera min şêrîn e
Ciwan û nazenîn e
Di rengê wê kes nîne
Deng awazê bilbil e
Xwendevan û gundî ye
Ji nijadê Mîdî ye
Li ba min surperî ye
Kêf û şahiya dil e
Çavên di reş tarîn e
Lêvê tenik ji xwîn e
Dêm çi sor û sipî ne
Di nêv berfê sorgul e
Devliken û rûgeş e
Ziman şêrîn û xweş e
Can û rewanê leş e
Kî wê d'bîne dihile
Biskên wê rengê dav e
Porê dirêj solav e
Jiyan bê wê pir xav e
Çavên reş tijî kil e
Hebûn û tunebûn e
Şahinşaha gerdûn e
Bûka çayê Sasûn e
Sor û Gor û Dumil e
Xec û Zîn û Şêrîn e
Ê rewşa wê nabîne
Bila bimr û nemîne
Deng ji wî jî bibile
Kulîlkek sor û zer e
Li ser wê ceng û şer e
Dil ji bo wê b'keser e
Keser her dem dilkule

EVÎN Û DILBER

Evîn çi ye?
Çi ye dilber
Kî ye ew fer?!
Ew e ya ku rewanê te
Bilerzîne
Ew e ya ku dilê te zû
Ji sînga te
Biderxîne
Di nêv sawîr û xewnan de
Bib û bîne
Hiş û raman û hizrê te
Ji kokê de
Bihejjîne
Ew e ya ku bihêle tim
Ji wan cam û peyalên
Tehl û şêrîn pir
Binoşîne
Bihêle ku bi heyvê re
Bi Perwîn û sitêran re
Şevên xwe tim
Biborîne
Ji rengê bilbilê dilkul
Di nêv baxan de ser şaxan
Bi awazan
Kul û derdan
Bi der bîne
Weke perwaneyê ku xwe
Bi arê işq û hezkirnê
Bisojîne
Ew e ya ku bihêle can
Ji pabendan
Xwe rizgar ke
Ji bo xaka welat zû xwe bigorîne

JI BÎR NAKIM

Ji bîr nakim welatê xwe
Çiya û deşt û latê xwe
Çemê Zab û Feratê xwe
Ji bîr nakim ji bîr nakim
Ji bîr nakim zozanê xwe
Xelat û him Sîpanê xwe
Mehabad û Berzanê xwe
Ji bîr nakim ji bîr nakim
Diyarbekrê ji bîr nakim
Divê dijmin ji wir rakim
Di her gavê ez ê ba kim
Ji bîr nakim ji bîr nakim
Ji bîra m naçe Hewlêrê
Ku bidne ser sitû kêrê
Ku ser laşê m bikin gêrê
Ji bîr nakim ji bîr nakim
Ji bîra m naçe Hemrînê
Cihok û kaniya xwînê
Belê şehrê Mem û Zînê
Ji bîr nakim ji bîr nakim
Ewî giryê di mendala
Giran barê l milê kala
Setemkarya sedê sala
Ji bîr nakim ji bîr nakim
Heval û hemdem û yara
Cihok û çem û cobara
Ewan geştê li nav dara
Ji bîr nakim ji bîr nakim
Ji bîr nakim Qamişlokê
Hekar û şehrê Zaxokê
Ruha û çayê Bagokê
Ji bîr nakim ji bîr nakim
Ewê dilşad û Newrozê
Gulê vedbin di bahozê
Xebatkarên li pey dozê
Keser ew wan ji bîr nake

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Kultûrname

DILQÊ MEDRESEYA KURDÎ DI VÊJEYA KURDÎ DE - 3

Zeynulabidîn Zinar

Ji destpêka Xwendina Medresê heta ku dawî lê dihat, şagird di sê pêngavan re dibihurîn:
1- Destpêka Xwendinê: Ev xwendin di sawiya dibistanê de bû.
2- Destpêka Feqîtiyê: Ev xwendin di sawiya mekteba navîn û lîseyê de bû.
3- Destpêka Talibtiyê: Ev xwendin di sawiya zanîngehê de bû.
Piraniya van şaxên cuda yên Medreseya Kurdî, her çiqasî ku bi zimanê erebî dihatin xwendin, lê dersdaran ew tev werdigerandin zimanê kurdî û dersa şagirdên xwe didan. Her weha çend pirtûkên ku xwerû bi zimanê kurdî bûne jî, bi dersîtî dihatin xwendin.
Di xwendina Medreseya Kurdî de derbaskirina wek pol (sinif) nebû, lê xwendina pirtûkan a li pirtûkên pey hevûdu de sufte bû ku jê re XWENDINA RÊZÊ dihate gotin.
Xwendina van pirtûkan wek zeman, di navbera15 û 22-25 salan de dihate kirin. Şagirdekî jêhatî û zîrek, dikaribû di 15 salan de jî kuta bikira. Lê eger şagird ne jêhatî bûya, belkî Xwendina Rêzê 20 heta 25 salan jî didomand.
Piştî ku xwendina Destpêka Talibtiyê diqediya, îcar dor dihate ser Wergirtina Îcazeya (destûrname) Xwendinê.
Piştî wergirtina destûrnameya Medresê, şagirt dibû xwediyê van xeysetan:
- Mafê meletiyê bi dest dixist û dikaribû hem meletî bike û hem jî dersa feqiyan bide.
Îcar kesên ku meletî dikin û ders bidin feqiyan jî, dibin du nivş:
1) Ji yekî re Meleyên Heftilmî tê gotin ku di Medreseya Kurdî de bi hindikî heft şaxên zanistiyê xwendiye.
2) Ji yekî re Meleyên Duwazdehilmî tê gotin ku di Medreseya Kurdî de bi hindikî duwazdeh şaxên zanistiyê û zêdetir dixwendiye.
Ji wan medreseyên kurdî zanayên pir mezin derketine ku di nava gelê xwe de, hem jî li Rojhilata Navîn, xasma jî li cîhana îslamî navûdeng dane û di pîşeya xwe de pir menşûr bûne. Ew şexsiyet, çi di warê olî û rêçikan (Terîqet) de be, çi di warê siyasî û serokatiya serhildanên kurdî de be û çi jî di warê zanistî, vêje û helbestvaniyê de be, karên pir hêja kirine.
Ji zarûkên kurdan zêdetir gelek turkmen, ereb, çerkez, çaçan, laz, gurcî û faris jî hebûne ku di Medreseyên Kurdî de perwerde dibûn.
Hin şexsiyetên wisa ji Medreseya Kurdî derketine ku ew êdî bûne malê dinyayê, wek Silhedînê Eyûbî yê kurd ku bûye hîmdarê duyemîn ê ola Îslamnê û wek Îsmail Cizîrî (1136-1206) ku ew wek bavê robot û computerê hatiye pejirandi.

KARÎKATÊR

Kurdî Xweş e

Parzemîn	قارة	Saman	ثروة
Geresitêr	كوكب	Jêrmal	قبو
Xerçeng	برج السرطان	Binesazî	البنى التحتية
Seyda	المدرس	Bawermend	مؤمن
Hosta	البناء	Jixwebawer	واثق

Gotinên Pêşiyan

- Dê dibistana zarokan e.
- Giliyê dê û bavê şîret in.
- Her qezayek şîret e.
- Ji mino li mino.
- Çav sûretê dilan e.
- Bela tê serê mêran.
- Av paqijî ye.
- Mij û dûman e, dema gur û roviyan e.
- Piştî her şerî aştî heye.
- Şûr kalanê xwe nabire.

Xaçepirs

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1							■		
2					■				
3						■			
4		■	■				■		
5				■	■				■
6								■	
7	■								
8		■				■			■
9			■						

Sitûnî

1- Kesê jiyandar, bi can – Cînavkeke xwerû ya pirjimar
2- Mezel, xurfe – Rengek
3- Bavikên kurdan ên ku Medya ava kirin – Alav
4- Ebîr belavkirî – Hilkef vajî
5- Benê zirav ê ku dirûtin pê tê kirin – Birina tiştekî bê ku tu kes pê hay bibe
6- Dijwateya sitand – Zabş belavkirî
7- Birayê bavê mirov vajî – Bajarekî Bakurê Kurdistanê
8- Maddeya ku di berika tivingê de ye – Du tîpên wekhev û di nava herduyan de tîpa r
9- Dar û qirşikên ku dikevin tenûrê – Veqetandeka pirjimar, qertafeke pevgirêdanê

ASOYÎ

1- Kesê merd, destvekirî – Hewa
2- Meheke salê – Serjimêr
3- Dijwateya dît – Maddeya ku nan jê çêdibe
4- Cûryekî firindeyan – Du tîpên wekhev
5- Serbest, ji azad – Nebaş, xerab
6- Meha ku xelk tê de rojê digirin
7- Dijwateya rabûn
8- Evîndara Cak – Agir
9- Cînavkeke tewandî ya pirjimar – Kesê ku bîr dibe

Sitêrname 12

Narîn Omer

Aslîka Qadir jina xurt û hêzdar e. Tevlî hestên wê yên nazik û dilê wê yê miştî vîn û aramî, lê karîbû bi xurtî li hember astengiyên jiyanê raweste, pirsgirêkên narvînê bê çare bike û serşûn bihêle.

Jiyana Aslîka Qadir:

Di demekê de ku Aslîka Qadir di germbûna xortaniyê de bû û kulîlkên evînê bi bayê hênik re baxê dilê wê dixemiland, mirina bêrêdan dest avête giyanê hevjînê wê û ji cendek kişand… ma dîla xem û derdan, hêlîna du zarokên baskşikestî. Lê hunermenda me bi hêzê, bi hestên dayîkê û bi dilovaniya bav karîbû xebata xwe di hemî waran de bidomîne û bi xurtî li ber xwe bide.
Hêjayî gotinê ye ku navê hevjînê wê Canîkê Teymûr bû. Ew filozof û kesayeteke navdar bû. Di sala 1982'yê de çû li ser dilovaniya Xwedê. Wî jî mîna hevjîna xwe di kaniya xebat û zanistê de avjenî dikir, lê mixabin, dema ku mirin biryara xwe dide li temen temaşe nake.
Piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê Aslîka Qadir bi zarokên xwe ve berê xwe dide Ewropayê û di 1995'ê de li Elmanyayê bi cih dibe. Li wir zarokên wê xwendinê berdewam dikin û bernameyên zanistî weridigirin.

Jiyana Hunerî:

Tevlî vê jiyana zordar û van astengiyan, Aslîka Qadir biryar dide ku ew jiyana hunerî berdewam bike. Bi vê yekê êdî bi xurtî hest û ramanên xwe gihand gelê xwe. Aslîka Qadir li kêleka hunermend û dengbêjên kurd doza gel û miletê xwe bi awayê rast û dirust nîşan dida.
Ji hunerê zêdetir, Aslîka Qadir rewşenbîr û çalakvaneke zîrek û jêhatî ye. Bawernameya bilind ji Zanîngeha Ermenistanê wergirtiye û di heman zanîngehê de bûye mamosteya zimanên ermenî û farisî. Bêhtir ji bîst û pênc salan xebata di hundirê zanîngehê de domandiye. Ji ber xebat û çalakiyên wê yên konevanî, ew di serdema Yekîtiya Sovyetê de dibe endama Perlemana Ermenistanê.
Aslîka Qadir di sala 1945'an de ji dayîk bûye. Malbata wê ya welatparêz jê re bûye alîkar û rêber ku ew xwendina xwe bi zîrekî biqedîne. Ne tenê wisa, lê di demekê de ku Yekîtiya Sovyetê ji hêla hunerî ve di gurbûna xwe de bû, malbata Aslîka Qadir destek dayê ku di biwara hunerê de xwe li pêş bixe û di babetên konevanî de jî jê re bûye palpişt.
Aslîka Qadir jî wekî hunermendên wê demê derbasî Radoyaya Êrîvanê – Beşê Kurdî dibe û çend sitranên xwe li gel hejmarek ji sitranên gelêrî tomar dike. Hunermenda me tekez dike ku ew yekem hunermend e ku di salên 1964 – 1965 de sitrana "Welatê Me Kurdistan e" gotiye û tomar kiriye. Di pê sirûda "Ey Reqîb" re, sitrana "Welatê Me Kurdistan e" bûye sirûda duyan a neteweya kurd û hetanî roja îroj jî ev sitran hêj li kar e. Her wiha ev sitran bûye nasnameya hunerî ya Aslîka Qadir.
Baxê hunera wê bi hemî rengên sitranan xemilandî ye; wekî sitranên: netewî, niştimanî, evînî û gelêrî... Hetanî aniha jî ji kaniya folklor û çanda kurdî vedixwe û bi dengê xwe yê zîz û xurt damar û hestan av dide.

Aslîka Qadir… Dengê Resen

Aslîka dixwaze bi dengê xwe û di qada hunerê de ji bilî nasandina doza gelê xwe, doza jinê jî diyar bike û binpêkirinên civakî yên der heqê wê de bi zelalî aşkere bike. Ji ber ku wê jî gelek zor û astengî di jiyana xwe de kêşane, ji lew re dixwaze ku jiyaneke aram û miştî evîn ji bo her jinekê peyda bibe.
Tevlî xebatên wê yên hunerî, çandî û konevanî... lê ew jî wekî hemî hunermendên kurd ji hêla ragihandin û medyayê ve mafê wê hatiye xwarin û bi qasî ku tê xwestin guhdan pê nebûye. Dema ku em di vê babetê de axivîn, Aslîka Qadir wiha got:
"Belê ev gotin rast in, lê di pêvajoyên jiyana min ya hunerî de, ya herî girîng li bal min: Hezkirin û guhdana miletê min ji min re ye. Ji ber ez ji wan re û ji bo wan disitirînim û dixebitim."
Em temenekî dirêj ji hunermenda xwe re dixwazin, her wiha serkeftin û bipêşveçûnê di hemî aliyên jiyanê de jê re hêvî dikin. Helbet ew ê her û her di rêza hunermendên navdar û nemir de bimîne.

Peyva Windayî

Da ku tu peyva windayî bibînî, van navan bi awayekî sitûnî xêz bike:
AGAHÎ – MAMOSTE – ARAS – KOR – BEYANDÛR – BA – GUND – DEKBAZ – BABELÎK – ZÛ – NA – SOZDAR – CAN – PÎROZMEND – ZANÎN – PIRRENG – BENDEWAR – JÊBIR – DOZ
Peyva windayî ji 5 tîpan pêk tê, ew jî navê bajarekî Rojavayê Kurdistanê ye.

J	Ê	B	I	R	Ê	A	R	A	S
B	E	N	D	E	W	R	K	O	R
B	E	Y	N	D	Û	R	K	B	A
D	E	K	B	A	Z	G	U	N	D
D	P	Î	R	O	Z	M	E	N	D
B	A	B	E	L	Î	S	K	N	A
S	O	Z	D	A	R	I	C	A	N
A	G	A	H	Î	Z	A	N	Î	N
P	I	R	R	E	N	G	D	O	Z
M	A	M	O	S	T	E	R	Z	Û

Bersiva Xaçepirsa Hejmara Çûyî

	1	2	3	4	5	6	7	8	9
1	C	I	N	D	Ê	R	I	S	■
2	I	■	A	A	■	R	I	M	■
3	W	A	N	■	M	■	■	Î	Î
4	A	A	■	T	E	W	R	A	T
5	N	■	K	Î	■	E	M	■	■
6	■	S	O	R	■	■	A	S	R
7	J	A	R	■	M	E	■	A	A
8	Î	R	A	N	■	E	G	R	M
9	R	A	Z	A	N	■	G	A	■